**Ronahî**
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1283 | 22-Pûşper-2025 | www.ronahi.net/ku/

**Navnîşan**
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Çîroka çivîkeke tijî ders û wane

**Ezîme Zagros**

Ey çivîka nazdar te çawa peyda kir ev cihê bi wate û qîmetdar. Çivîkeke delal ku li cihekî bi ewle digeriya hêlîna xwe lê çêke, ji bo ti destên biyanî negihêjinê, hêkên xwe lê deyne û çêlîkên xwe bi ewlehî, bi dilekî pir bi aram mezin bike. Çivîka me ya narîn gelekî geriyaye, westiyaye û ji destên biyanî bi guman bûye. Herî dawiyê berê xwe dide mala hevalên gaziyên şer û bi taybet jî li eywana malê li cihekî bilind ê wêneyê Rêber Apo li dîwarê wê û li ser deriyê malê daliqandî ye, hêlîna xwe li ber qiraxa wêneyê Rêber Apo çêkiriye.

Dem û cih qet ne girîng e û ya herî girîng jî ew e çawa di navbera wan de girêdan tê çêkirin, bi rengekî hevseng hevdû didin jiyandin û qet zerarê nadin hev. Divê were zanîn ku xwezaya me wer hatiye hevsengîkirin, lê mixabin hişmendiya mirovan û ezeziyeta wan hevsengiya xwezayê, pergala civakê jî xerab kiriye. Aniye rewşeke ku hew tê debarkirin. Teqez divê were zanîn ku xweza hemû zindiyên di nava xwe de hevseng kirine, wateyên pir bedew li wan bar kiriye, parastine û anîne vê rojê. Weke ronahiyê tevahî zindî di milê ruhî de bi wate kirine, nirx daye wan û ew kirine hevparê ruhê xwe yê gerdûnî. Lê belê mirovan bi hişmendiya xwe ya ferdperestî xweza û civak ji xwe re kirine qurban.

Lewra hevdû hîskirin û naskirin ew e, ku mirov hevdû ji bîr neke. Rêber Apo di pêvajoya zarokatiya xwe de li hemberî xweza û zindiyên bêyî hemdê xwe zerar daye wan jî lêborîn ji wan xwestiye. Ji bo vê jî wê çivîkê xwestiye bi çêkirina hêlîna xwe ya li ser wêneyê Rêber Apo yê hevparê xwe yê wefadariya gerdûnî re hevaltî û sedaqeta xwe berdewam bike. Wê çivîkê hewl da ku heval û hogirê xwe bi tenê nehêle. Ji ber li Îmraliyê 27 salên Rêber Apo çêbûne û hîn jî êşa wê tenêtiyê dikişîne. Îro jî çivîka hestiyar û bedew li rex wêneyê Rêber Apo yê ji tevahî zindiyan hez dike û wan hîs dike hêlîna xwe çêkir. Ji bo çêlîkên xwe di bin siya Rêber Apo de biparêze û wan mezin bike. Hevalên gazî jî ew çivîka bedew



xwedî dikin, diparêzin ji bo çêlîkên xwe bi firê bixe û bedewiya xwe belavî tevahî cîhanê bikin.

Min xwest ez vê mijarê binivîsim da ku her kes bibîne bê çawa Rêber Apo ji zindiyan hez dike û zindî jî Rêber Apo ji xwe re dikin cihê star û ewlehiyê. Hewldanên min ew in ku ez bi rêya vê nivîsê ji we re bidim nîşandan ku hezkirina Rêber Apo ya kûr ji teyr, çivîk û tilûran re çawa hişt ku ev çûk jî hêlîna xwe li ber wêneyê Rêber Apo çêbike û li wir bi aram bijî. Ez wiha hêvî dikim xebera vê çûkê bigihêje Rêber Apo û li ser wê şîroveyên xwe yên siyasî bike. Divê were zanîn ku girêdana Rêber Apo ya ji xwezayê re gelekî xurt e û tevahî zindiyan hîs dike. Ez ji dil û can silav û hezkirinên xwe ji Rêber Apo re dişînim û temenekî dirêj jêre hêvî dikim. Ez dibêjim, Canê me fedayî te ye û em bi te serbilind in. Em ê ji bo, azadiya te ya fizîkî canê xwe jî feda bikin.

## Bi wêneyan dibe dengê Xezayê



Îsraîl, ji 7'ê Cotmeha 2023'yan ve heta niha êrîşên li ser Zîvala Xezayê bênavber didomîne. Li Xezayê hema bibêje hemû avahî hilweşiyane. Hêzên Îsraîlê bi taybetî jin û zarokan hedef digrin, bombeyan bi ser kesên li konan dimînin dibarînin. Li Zîvala Xezayê ji her alî ve dorpêç heye û hemû kes ji vê yekê zirarê dibînin. Kesên hunermend jî her dem bi mirinê re rûbirû dimînin lê berhemên wan li pêşangehên navneteweyî tên pêşandan. Di her berhemê de behsa komkujiyên li bajar tê kirin. Cîhad Jarbou ya wêneyan çêdike diyar dike ku tecrubeya hunerî ya di dema şer de ji ya berê cudatir e. Cîhad Jarbou balê dikşîne ku beriya şer ji bo çêkirina berheman, gelek cerebeyan dikir, her dem li ser peyamên di berheman de disekinî û diyar dike ku beriya êrîşan jî di berhemên xwe de li ser dorpêçê wêne xêz kirine lê niha bûyerên ku diqewimin belge dike.

**Bi awayên cuda dibe dengê Xezayê**

Cîhad Jarbou diyar dike ku bi destpêka êrîşan re bav û birayê wê hatine kuştin, demek dirêj fikiriye bi awayekî çawa hunerê bike û dibêje ku bi pirtûkek taybet a bi navê "Here Is My Life" dest bi tecrubeya dokumanter kiriye. Cîhad Jarboy got ku wê ji têgeha derxistina ji cih û warê xwe bigre, heta mirovên ku ji bo avê dikevin rêzê, ji malên xwedîkirinê heta mehremiyeta di konan de, li ser gelek mijaran disekine. Cîhad Jarbou her wiha li ser wênesaziya ku navê "Hafiza" lê daniye jî kûr bûye. Di berhemên xwe de bi bikaranîna rêbazên cuda tiştên cuda diafirîne û di heman demê de dengê bav û birayê xwe yê ku hatine kuştin radigihîne.

**'Dixwazim serpêhatiya xwe vebêjim'**

Cîhad Jarbou diyar dike ku beriya dorpêçê berhemên wê di pêşangehên cuda yên navneteweyî de hatine pêşandani ji ber dorpêça heyî nikare berhemên xwe çêbike û wiha dibêje: "Dengê roket û bombeyan derûniya min xirab dike. Ji ber êrîşan nikarim bixebitim lê evîna min a hunerî didome. Ez dixwazim serpêhatiya xwe vebêjim. Ji ber dorpêçê nikarim xelatên ku li welatên din ji bo berhemên min hatine dayîn bigrim. Ev yek jî min gelek diêşîne û şîna min dike du qat." **NÛJINHA**

Sudoku: Bersiv 44

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 4 | 9 | 3 | 8 | 5 | 1 | 7 | 6 |
| 5 | 8 | 6 | 9 | 7 | 1 | 4 | 2 | 3 |
| 3 | 1 | 7 | 6 | 4 | 2 | 8 | 5 | 9 |
| 4 | 2 | 1 | 7 | 3 | 6 | 9 | 8 | 5 |
| 6 | 5 | 3 | 8 | 2 | 9 | 7 | 1 | 4 |
| 7 | 9 | 8 | 5 | 1 | 4 | 3 | 6 | 2 |
| 9 | 7 | 2 | 4 | 6 | 8 | 5 | 3 | 1 |
| 8 | 6 | 4 | 1 | 5 | 3 | 2 | 9 | 7 |
| 1 | 3 | 5 | 2 | 9 | 7 | 6 | 4 | 8 |

Sudoku:Pirs 45

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | 7 | | 4 | 5 | | |
| 1 | | | | 8 | 9 | | 4 | |
| | 6 | 7 | 1 | | | 2 | | |
| 7 | 5 | 4 | | | | 1 | | |
| | | | | | | | | |
| | | 2 | | | | 8 | 9 | 5 |
| | | 6 | | | 8 | 3 | 2 | |
| | 4 | | 3 | 5 | | | | 1 |
| | | 3 | 2 | | 7 | | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER HÊVÎKIRIN Û XWESPARTINÊ**

**Destên xwe mist dan:**
- Li ber geriya; hêvî jê kir; rica jê kir; xwe piçûk kir.

**Destên xwe ferikandin:**
- Bi heman wateyê.

**Ez li ber te, Xwedê li ser te:**
- Dema yek xwe dispêre yekî, yan doza lêborînê lê dike, yan tiştekî jê dixwaze hingê dibêje.

**Ez li bextê te me:**
- Dema pêwîstiya yekî pir bi yekî hebe, hingê dibêje.

**Ez ketime bextê te:**
- Ez hêvî ji te dikim; ez tikayê ji te dikim.

**Min xwe avêtiye ber bextê te:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER BÊBEXTIYAN**

**Bexteba ye:**
- Bêbext e; dikare bextê xwe biavêje.

**Çala wî kola:**
- Bêbextî lê kir; xapand; bû sedem ku zerereke mezin bibîne.

**Em firotin:**
- Bêbextî li me kir; xiyanet li me kir.

**Ga bi rê dike, golikan pa re pê dike:**
- Bêbextiyan dike.

**Kirasê bêpêsîr di stûyê min de anî:**
- Bêbextî li me kir.

**Kirasê bêpasûk (pastî) dixe hurtiye mirov:**
- Bi heman wateyê.

**Kirasê nedirûtî li me kir:**
- Bi heman wateyê.

**Kirasê xwe li me kir:**
- Bêbextî li me kir; sûcê xwe xist stûyê me.

**Kumreş e/kumreşiyan dike:**
- Bêbext e; bêbextiyan dike; derewan dike.

**Kumreş e bextreş e:**
- Hem tiştên xirab dike hem bêbextiyan li kesên din dike.

**Li dû me dahol kutan:**
- Bêbextî li me kirin.

**Navnûçikan lê dike:**
- Bêbextiyan lê dike; bi tiştên nekirî sûcdar dike.

**Nav bi me ve kir:**
- Bêbextî li me kir.

**Nav bi me ve danî:**
- Bi heman wateyê.

**Qulpek pê ve kir:**
- Kêmayiyek jê re dît; sûcek jê re çêkir; sûcdar kir.


**Rûyê min reş yê te spî:**
- Tu bêbextiyan dikî; min tişteke wisa nekiriye/min tişteke wisa negotiye.

**Rûyê xwe reş dike:**
- Bêbextiyan dike; derewan dike.

Va ez û va tu:
- Tu bêbextiya li min dikî.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Di nameya Rêber Apo de perspektîfên girîng hene û divê em li ser lêhûrbûn bikin'



Endama Akademiya Jineolojî Elîf Berk diyar kir ku Rêber Apo têgeha Jineolojî cara yekem di sala 2008'an de di parêznameya Sosyolojiya Azadiyê de anî ziman û wiha got: "Nameya Rêber Apo ji bo Akademiyên Jineolojî cihê kêfxwaşî û serbilindiyê ye. Di pêkanîna wê projeyê û azadiya jinê de, jineolojî xwedî cihekî taybet e."**R-2**

## Xîtaba kîn û nefretê û têkoşîna li hemberî wê



Nivîskar û danerê di qada geşpêdana mirovî de Hejar Rustem Abdulfetah rave kir ku xîtaba kîn û nefretê diyardeyeke ku ewlehiya aştiyane li Sûriyê tehdît dike, herwiha tekez kir ku têgihştin û hişyariya civakê çareseriya herî guncaw e ji bo sînordarkirina vê diyardeyê di Sûriyê û tevahî cîhanê de.**R-6**

## Di dîrokê de têkiliyên Kurd û Tirkan




Piştî koçberiya Tirkan qedera Rojhilata Navîn jî hat guhertin, gelek bajar hatin wêrankirin û xwestin demografiya herêmê jî bidin guhertin. Wek hemû gelên Rojhilata Navîn Kurdan jî para xwe ji zilm û zordariyê girtin.**R-4**

## Navenda Pargîn a çand û hunerê



Navenda Pargîn a Çand û Hunerê ku yek ji destkeftiyên Şoreşa 19'ê Tîrmehê ye, di navbera gundê Tepikê û Besta Sûsê yên girêdayî bajarê Dêrikê hatiye avakirin. Armanca Pargîn parastina çand û hunera resen a gelên herêmê ye.**R-7**


**Ronahî**
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1283 | 22-Pûşper-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# ÇETE XWÎNMIJÊN GELÊN SÛRIYÊ NE Û DIVÊ BÊN CEZAKIRIN

Piştî destpêkirina kirîza Sûriyê û destwerdana hêzên herêmî û cîhanî di kirîzê de, bi dehan komên çete li ser axa Sûriyê hatin avakirin. Herî zêde dewleta Tirk a dagirker piştgirî da van koman û ew ji bo berjewendiyên xwe bikar anîn. Van koman li dijî gelên Sûriyê tevahî kiryarên dijmirovî pêk anîn û heta niha jî sûcên wan berdewam in. Piştî rûxandina rêjîma Baas, li şûna dadgehkirina van çeteyan li ser sûcên wan, biryar hat dayîn ku tevlî artêşa Sûriyê ya nû bibin. Li hemberî wê jî gelên Sûriyê nerazîbûna xwe nîşan didin û banga cezakirina çeteyên sûcdar dikin.**R-5**









## Ji dema Serxwebûnê ve sîstemên desthilatdariyê li Sûriyê û sîstema herî guncaw ji bo Sûriya îro... (2)



Serdemeke nû di dîroka Sûriyê de bi serkêşiya Partiya Baas dest pê kir ku ew serdem bi tepeserkirina rikberîya siyasî ya resen û kesên rikber dihate naskirin. Di heman demê de di pevçûna wan bi Israîlê re piştgirî da Filistîniyan ku bû sedema rûdana Şerê Hezîrana 1967'an de, şikestina Hezîranê ku di wî şerî de Sûrî, Misir û Urdun zirarên giran li ser destên Israîlê dîtin.**R-3**



**Çare û rêbaz**
Sînan Cûdî R-4



**Sîstema Temsîla Heqîqeta Civakê Neke Têk Diçe**
Idrîs Henan R-5



**Sedsaliya Sêdareyê**
Hafiz Ahmet Turhalli R-6



**Çêkirina strana azadiyê**
Remezan Olçen R-7

# ‘Di nameya Rêber Apo de perspektîfên girîng hene û divê em li ser lêhûrbûn bikin’

Endama Akademiya Jineolojî Elîf Berk diyar kir ku Rêber Apo têgeha Jineolojî cara yekem di sala 2008’an de di parêznameya Sosyolojiya Azadiyê de anî ziman û wiha got: “Nameya Rêber Apo ji bo Akademiyên Jineolojî cihê kêfxwaşî û serbilindiyê ye. Di pêkanîna wê projeyê û azadiya jinê de, jineolojî xwedî cihekî taybet e.”

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**


Rêber Apo ji zaroketiya xwe de hevaltî bi jinê re dikir û koletiya li ser jinê tê meşandin qebul nedikir, zihniyeta kapîtalîzim a di nava civakê de hatiye çandin red dikir û herdem ji bo mafê jinê têkoşîn û xebat dikir. Rêber Apo ji bo ku jin xwe nasbike, mafê xwe bizanibe, koletiyê ku li ser tê kirin qebul neke û ji bo azadiyê têkoşîn bike zanistek ji bo jinê afiriand ew zanist jî ‘‘Jineolojî’’ ye zanista jinê ye. Rêber Apo têgeha Jineolojî cara yekem di sala 2008’an de di pareznameya Sosyolojiya Azadiyê de anî ziman. Namaya Rêber Apo, ê ku 30 Gulanê 2025’an hat eşkerekirin ew name ji bo akedemiyên jineolojî, xebatên jineolojiyê û ji bo tevahî jinan e.

Derbarê nameya Rêber Apo ji bo akedemiyên Jineolojî re Endama Akedemiya Jineolojî Elif Berk bersîva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bo:

**Rêber Apo di nameya xwe de ji bo jinê çi anî ziman û naveroka nameyê çi bû?**

Rêber Apo, têgeha Jineolojî cara yekem di sala 2008,an di pareznameya Sosyolojiya Azadiyê de anî ziman. Ji 2009’an pê ve, ji çiyayên azad bigirin heta deşt û bajaran, ji Kurdistanê heta dewerên dûr ya cihanê, niqaşên Jineolojiyê belav bû û xebatên jineolojî hate rêxistinkirin. Di sala 2015’an Akademiya Jineoloji avabû. Salên dirêje di bin sîwanê Akademiya Jineolojiyê de xebatên cur be cur ji bo rast pênasekirina nasnameya jinê, ronîkirina dîroka jinê, ronî kirina dîroka nasnameya zilamê serdest û camêrî, lêkolîn kirina nirxên civakê ji derveyî desthilattarî, avakirina derfêtên lêhurbûyin ji bo xwebûn, ji bo hevjiyana azad, dimeşe. Tekiliyên xebatên jineolojî, raste rast bi tekoşîn û rexistinbûna jinan ve heye û zindi ye. Lewma, jineolojî zanisteke teorik nine, jiyani ye. Peyama Rêber Apo, ê ku 30 Gulanê 2025’an gihişt ber destê me, ji bo xebatên jineolojiyê û ji bo tevahî jinan cîhê kêfxweşî û serbilindiyê ye. Di vê peyamê de ji bo têkoşina azadiya jinan perspektîfên pir girîng heye ku, divê em li ser lêhurbûn bikin.

Rêber Apo di peyama xwe de xalên gelek girîng tîne ziman. Dibêje, “Min ji zarokatiya xwe ve hewl da ku ez bibim heval û rêhevalê jinê yê herî baş. Di têkiliya min û dayîka min de jî, lêgerîna min a ji bo jina azad dikare were dîtin. Ez girêdayî xeyalên



xwe yên zarokatiyê mam, bi wî rengî min jiyan kir û têkoşîna azadiya jinê derxist holê.” Em careke din lêgerîn û hewildanên Rêber Apo bînin bîra xwe.

Rêber Apo weke rêhevalê jinan, keda herî mezin ji bo pêşxistina rêxistinbûna jinan, avakirina rêgezên bingehîn ya têkoşîna azadiyê daye. Di salên 1970’î de di dema gera welêt de, bindestiya Kurdistanê bi bindestiya jinan ve dide girêdan. Li wir digihêje encamê ku heya jin azad nebin Kurdistan jî azad nabe. Ew ne tenê tespîtekî teorîke, tespîtekî jiyanî ye. Bêçaretiya jinan dibîne, civak çawa ji hev ketiye dibîne û bi eşqekî mezin dikeve pay armancê şiyarkirina hiş ji xewa mirinê. Lêgera Rêber Apo, çinîna tovên azadiyê, tovên xwebûnê ye. Di salên 1980’î de analîzên civaka Kurdistanê, bi tahlîlên “di Kurdistanê de pirsgirekên jin û malbatê” ve digêheje lutkeyê. Pirsgireka azadiya jinê, weke pirsgirekekî bingehîn di pêkanîna Şoreşê Kurdistanê de dibîne. Wê rastiyê di peyama xwe de wiha tîne ziman: “Wekî ku Budha gotiye; “Heta ku tu xençera di pişta civakê de dernexînî, tu nikarî qet tiştekî bikî”. Belê, gelek pirsgirêkên civakê hene, lê xencera di piştê de koletiya jinê ye û heta ku tu vê xencerê dernexînî, tu nikarî ti pirsgirêkan çareser bikî.” Dema jin, di dawiyê 80’î û destpêkê 90’î de pêşengtiya serhildanên gel dikin û diherikin nava refên azadiyê. Hişmendiya serdestiya zilam careke din hewil dide hikmê xwe ferz bike, lêgera azadiyê jinê, bi aqlê zilamtiyê ku jinê kêm dibîne, sînordar bike. Jinên ku bi biryar di rizgarkirina welatê xwe de dixwazin barê xwe hilbigirin, paş de gav neavêtin. Lê di peydakirina rê û rêbazên têkoşînê de jî hê tecrubeyê pêwîst kom nebibû. Rêber Apo, bi tahlîl û pêşniyarên xwe, bû palpiştê têkoşîna jinan, rêya jinan ronî kir. Jinên tekoşer rêhevaltiyê Rêber Apo ji dil hembêz kirin û bûn şopdarên herî girêdayî ya rastiya Rêbertî. Rêber Apo her carê got, “Hewildanê min ew e ku ez bibim rêhevalekî baş ya jinan”. Di meşa ew rêhevaltiyê de kevirên bihgehîn raxist, weke rêxistinbûna jinan, arteşbûyîn, teoriya veqetînê ji dewlet, malbat û mêr, guhertina




veguhertina mêr, îdeolojiya rizgariya jinê, partîbûn, pêşxistina peymana jinan bi civakê re, pergala konfederal ya jinan û hevserokatî, jineolojî û hevjiyana azad.

Rêber Apo bixwe di peyama xwe de wiha behsa wî rêwîtiyê dike: “Min her tim got, divê jina azad çawa be û ji bo wê proje, teorî çêkirin min bîrdoziya azadiya jinê û Jîneolojî pêş xist, min ev gihand hêza rêxistinbûnê. Min ji bo veguherandina mêr û bi rêya jinê azadkirina civakê hewldan kir, xebat meşand. Ji bo ku bibim zarokekî hêjayî xwedawendan, min ev yek kiriye. Ez bendewarim ku min bi vê rastiya min, bi awayekî rast fêm bikin.”

**Rêber Apo di namaya xwe de dibêje, “Bingehê rastî a ji bo Sosyalîzmê azadiya jinê ye, mebesta seroketî çi ye?**

Dîroka rêwîtiya jinan, qasî ku hewildanên fêmkirin û guhertina rastiya jinê ye, ewqas jî hewildanên yekbûyînê bi vê rastiya Rêbertiyê ye. Bi her gavekê, jin di dîroka xwe de, nasnameyê xwe de kûrtir bûn û rêgezên xwebûnê diyar kirin. Armanca rizgariya jinê ber bi azadiya jinê ve çû. Her ku jinan ji bo ji zincîran rizgar bin têkoşîn kirin, civak jî bi xwe re dan guhertin. Maneya “Azadiya civakê bi azadiya jinê ve girêdayi ye”, di rastiya têkoşîna jinên Kurd de şênber bû. Tevgera Azadiya Kurdistan bû haweyna civaka nû, jiyana nû. Derfetên têkiliyên nû avabû. Hat zelalkirin ku têkiliyên jin û mêr ne mahkûmî sînorên dayikbûn, hevjînbûn yan xizmayetiyê ye. Nasnameya jina azad jî bi wan sînoran nayê avakirin. Ji ber vê yekê têkiliya Rêber Apo û jinan, dostaniya jin û mêr carekê din li derdora rêgezên jin-dayikê ye û xwedawanditiyê vejîn kir.

Rêber Apo nasnameya Afrodîtbûn da ber jinan jina ku ji hebûna xwe fedî nake, jina ku bi xweşikbûna xwe herkesî li derdora xwe kom dike, jina ku rêgezên jiyanê diyar dike, jina ku diafîrîne; êdî vebijerkên jinan heye, jinan dizanîn ku ne mehkumî koletiyê ne, ne mehkumî jiyanê ku ji wan re weke qederê wan hatiye sepandinê ne. Hê jî jinên ku qet nafikirin îhtimalên vebijerkên cûda hene, û hê jî jiyana jinên ku ji rêya ku ji wan re hatiye ferzkirin lêpirsîn dikin û pêkneynîn, di bin xeteriyê de ne. Lewma, tekoşina azadiya jinan hê jî têkoşîneke bingehîn di avakirina civaka demokratîk de ye. Lewma her ferdê civakê ku bi rista pêşengtiyê radibe, divê xwe li gorî wê rastiyê bipîve. Ez çiqas diêşim bi wê rastiyê ku jin tê de tên kuştin. Têkoşîna me çiqas vebijerkên nû vedike ji bo jinan? Rêber Apo dema xwe weke zarokekî hêjayî jinan tarîf dike, balê dikeşe ser vê yêkê. Di peyama xwe de jî dibêje: “Pêwîste bê zanîn ku min her tim xwest jin bijîn û ew bên jiyandin. Her windahiyek wan her tim ez êşandime. Ji bo min gotin, ‘Ew kurê xwedawendê ye’. Min jî xwest ez bibim kurekî (zarokekî) hêjayî jinan. Vê yekê rêgeza (hêmana) bingehîn a têkoşîna min diyar kiriye. Min ji bo jinan, ‘Rêgeza Hêviyê’ pêş xist. Min got, ‘Pêwîste her jinek azad bibe’. Wekî mêrekî min jî bi pîvanên etîk û estetîk ên li gorî azadiyê şekil girtine, xwe terbiye kir. Min got, ‘Rêgeza bingehîn a Sosyalîzmê azadiya jinê ye’. Pîvana mêrekî ya sosyalîstbûnê jî ew e ku zanibe li gel jinê bi awayekî rast bijî. Ev rêgeza bingehîn a Sosyalîzmê ye”. Bi taybetî mêrên ku iddiayê wan ya demokratîkbûnê heye, divê li ser vê yekê bifikirin. Jin û rêxistinên ku pêşengtiya têkoşîna azadiya jinê dikin jî, divê bifikirin ka em çiqas dibin hêvî ji bo jinên ku bê çare ne, jinên ku tîna azadiyê ne; “rêgeza hêvî” em çiqasî jiyanî dikin.

**Ji bo Jineolojî zanista wê pêşxistin û naskirin erka ku dikeve ser milê jinê çi ye?**

Rêber Apo, di peyama xwe de dibêjê, projeya wî ya nîvçoyî mayî êdî temam bûye, mayî pêkanîna wê. Di pêkanîna wê projeyê, ango azadiya jinê de, jineolojî xwedî cihekî taybet e. R;ber Apo wiha dibêje “Dema ez nû anîm Girava Îmraliyê min gotibû; ‘Xebata min a derbarê jinê de projeyeke ku nîvçe maye ye’. Ev xebata min êdî temam bûye û tişta dimîne pêkanîna wê ye. Projeya min a nîvçe maye, bi Jîneolojiyê re jî meşiya. Min xwest bi vê teorî û têgehê pirsgirêka jinê rast pênase bikim. Kedeke bi nirx hatiye dayîn. Niha pêwîst e ev ked, bi pêvajoya nû re hîn zêdetir wateyê qezenç bike.”

Jin, keda ku heta niha daye çawa dikare bixe xizmetê pêvajoya nû? Bê guman bi rast fêmkirina girêdana azadiya jinê û civakê, azadiya jinê û sosyalîstbûnê, em dikarin bibin bersiv. Jineolojî, derfeta nûjenkirina zanebûna jinan li ser bingeha civaka demokratîk û azad vedike. Nasnameya jinê ku bi zincîrên bindestiyê hatiye avakirin, bi exlaqa azadiyê derman dike. Rêbazên lêhurbûyîn û lêkolînê ji bo fêmkirina rastiya jinê, pêşdixe. Di vê derbarê de xebatên Akedemiya Jineolojî, li her deverê Kurdistanê û cihanê her diçe li pêş diçe. Xebatên jinan ji bo pêşxistina Jineolojî li heremên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî berdewam dike. Erkên me weke jin ew e ku em xwe û civaka xwe ji hêmanên zayendperest paqij bikin. Vê yekê jî hama ji ber xwe ve çênabe. Ked pêwîst e, xwe êşandin pêwîst e, derfetên ku em bikaribin li ser xwe bifikirin û xwe li ser hêmanên azadiyê avabikin pêwîst e. Di nava teşqelayê jiyanê, zor û zehmetiyên têkoşînê de hin caran em erkên xwe yê xwe perwerdekirin ji bîra dikin. Mêjî û dilê xwe perwerdekirin, ji me re şertekî bingehîne ji bo ku em bikaribin bibin ya xwe. Rêber Apo jî di peyama xwe de dibêje “Divê jin ji bo vê yekê lêhurbûn bikin. Eynî wekî ku V. Woolf gotiye; divê odeyek aydê jinê bi xwe hebe. Pêwîst e derbarê xwe de bifikire û karibe xwe ava bike.”

Rêber Apo, di dawîyê peyamê xwe de, baweriya xwe ji bo pêşengtiya jinan di pêvajoya “Aştî û Civaka Demokratîk” de, tîne ziman. Dibêje ku “Ji niha û pê de jî, ez ê her tim qasî ku hûn pêdivî dibînin bi we re bijîm û bi we re bim.” Weke zarokekî hêjayî ya xwedewandan, weke rêhevalekî daîmî ya jinan, ji me re rê nîşan dide, hêz dide. Erka me ew e ku em bi erkên xwe yê rêhevaltî rabin, nasnameya jinê ku layiqê keç û kurên xwedawendan e, avabikin.



# Navenda Pargîn a çand û hunerê

Navenda Pargîn a Çand û Hunerê ku yek ji destkeftiyên Şoreşa 19'ê Tîrmehê ye, di navbera gundê Tepikê û Besta Sûsê yên girêdayî bajarê Dêrikê hatiye avakirin.  Armanca Pargîn parastina çand û hunera resen a gelên herêmê ye.

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

Ji bo lêkolînkirin û belgekirina kevneşopan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Navenda Lêkolîn û Parastina Kevneşopa Rojavayê Kurdistanê bi navê ‘Pargîn’ ku girêdayî Desteya Çand û Hunerê ye, di sala 2020’an de li herêma Koçeran di navbera  gundê Deşta Sûsê û Tebkê de hatiye avakirin.

Di zivistana sala 2020’an de weke gava destpêkê amadekarina avakirina navenda Pargîn hat kirin, bi demê re çaksazkirin bi alîkariya hijmarek ji keç û xortên herêma koçeran hat kirin. Di destpêka sala 2021’an de navend ji milê cih, endam, perwerde û teknîkê bi keda keç û xortên Pargîn hazir bû. Piştî qedandina perwedeyên fikrî, çandî û teknîkî êdî amadekirin hat kirin da ku dest bi derxistina berheman bê kirin.

**Wateya navê Pargîn**

Wateya navê Pargîn wek têgîn; Dema mirov kon li cihekî vedidê û derdora kon dikolê da ku wê ji lehiya baranê biparêzê, endamên Pargîn ev nav hibijartin da ku civaka xwe ji qirbûnê biparêzin ji ber ku koçer wek paşmayên çandên resen yên vê herêmê tên dîtin. Heger nehat parastin bi demê re wê qir bibe. Hijmara endamên navenda Pargîn 15 kesin. Di vê navendê de gelek beş hene wek; Beşê teknîkê, kêşan, montac, cil û berg, sînariyo û deng. Beşên lêkolînê rojane kar lêkolîn dikin û bi riya beşê teknîkê belav dikin. Ji ber ku ev wek navendeke lêkolînê ye lewma divê hemû pêdiviyên wan li cem wan hebin.

**Kar û xebat Pargîn**

Ji ber ku di dîrokê de gelê kurd di qirkirinan re derbas bûne û bê erşîf mane, lewma Pargîn ev bar girtiye ser milê xwe ku hin lêkolîn û erşîfan ji bo kurdan peyda bike û belge bike. Herwiha pêwîstî heye ku kurd dîroka xwe nasbikin, Pargîn netenê ji bo belgekirina lêkolînên nivîskiye, di heman demê de dîmen û mozîkê jî pêşkêş dikin. Ev mozîk jî li gor babeta lêkolînê tê çêkirin. Mînak dema mijar meşik be wê dîmen, lêkolîn û mozîk jî hemû li ser meşkê bin ev yek wê sûdê bide kesê ku lê temaşe bike, him di milê agahiyan de him jî di milê temaşekirinê de. Şêwazê rast ji



lêkolînê re pêwîste mirov civakê ji hev cûda bike, da ku destnîşan bibe çawa mirov lêkolînê bike. Ji ber ku civaka kurda ji du beşan pêk tê civaka çandiniyê û ya koçertiyê. Di destpêka mirovahiyê de jiyan hemû bi koçeriyê derbas dibû, piştî şoreşa çandiniyê êdî civakên çandiniyê çêbûn, lê li milê civaka çandiniyê civakên koçertiyê jî heye. Êdî pêwîstî hebû ku Pargîn şêwazên jiyanê yên van çanda bidin destnîşan kirin û amûrên jiyana wan jî. Lewma 41 xelak li ser vê babetê hatin çêkirin, têde amûrên jiyana van civakan û sîstema jiyana wan çiye. Di her xelekekî de stranek teybet bi mijarê heye ji ber ku kurd heya ku bikaribin tiştekî bînin ziman bi mozîk tînin ziman. Her wiha pargîn dengbêjiya kurdan bi amûr û şêwazekî nû pêşkêş dikin. Pargîn zarokan jî fêrî dengbêjiyê dikin, zarok beşê wan yên lêkolînan jî heye, di dema dawî de nêzî 60 zarokî berê xwe dan gundên xwe lêkolîn li ser dîroka gundê xwe çêkirin ji hemû aliyan ve, di encamê de van zarokan her tişt li ser gundê xwe nas kirin û ev agahî wek lêkolîn û belge li navenda Pargînin. Zarok berê xwe didin Pargîn û li Filmên ku li gorî çand û temenê xwe temaşe dikin.

**Berhemên Navenda Pargîn**

Navenda Pargîn xwedî berhemên taybet û cûda ye, berhemên wan jî ev in; 41 xelekên lêkolînê li ser alav û şêwazên jiyana civakên li Kurdistanê. Starana Çere, strana Siwaro, strana Peyîzok. Pargîn tevlî du pirojeyên mezin bû, yek ji wan Destana PKK’ê bû ku 8 meha li Pargîn berdewam kir, pirojeya din jî Keziyên Sor ev berhema Hilala Zêrîn bû lê Pargîn 6 mehan tevlî vê berhemê bû li bajarê Qamişlo.

**Cil û Bergên Koçeran**

Çi cil û bergên ku di cîhanê de tê dîtin ji Kurdistanê derketine, ev yek bi belgeyên dîrokî ye, ji ber ku di kurdistanê de demsalên cûda hene, lê li welatên din 8 meh zivistanin û havîn û buhara wan tevlî heve. Erdingariya Kurdistanê gelek xweş û cûdaye, civakên erdingariya wan bi vî rengî hemû cûreyên cilan li cem wan derdikevin. Cilên koçera finda hemû cila ye, di dîrokê de tê zanîn ku civakên ku sewalan xwedî dikin ew civakên dewlemendin û abûriya wan xurt e, ji ber ku di nav civakê de tengav nabin, heger li cihekî çêre nema dikarin bar bikin û ji cihekî herin yekî din. Ev civak di encama şêwazên jiyana xwe de dewlemend bûn, mirovên dewlemend hertim bandor li dirûv, cil û bergên wan jî bide, hertim cilên bi qîmet û xemilandî li xwe dikin. Pargîn parçeyek çaw li cem heye temenê wê vedgere 300 salî, navê wî şapik e ji mûyê bizina Çûr çêbûye, dema mirov li wî şapikî dinêre rengê sor serdestê, koçer ji rengê sor hezdikin ji ber ku rengê kuristanê sor e, çiqasî mirov parçeyên çaw hilîne nikare 300 salî biparêze, ev şapik bi pisporî hatiye çêkirin dema mirov lê dinêre mirov dibêje qey nû ji fabrîqê derketiye.

**Pirojeyên dema pêş**

Pargîn hertim di nav kar û pirojeya deye lewma gelek pilanên wan ji bo dema pêş hene ji wan ev in; Hazirkirina Belgefilmekî li ser Çiyayê Qereçox, ji ber ku gelek çîrok li ser çiyayê Qereçox hene da ku ji civakê re zelal bibe.  Di heman demê de berhemek Pargîn wê di demek nîz de derkeve kilîpek li ser govenda zarokaye, nirxekî pargîn yê herî pîroz heye ew jî Şehîd Tekîne, pêşengê vê tevgerê ku bi sala ked daye û dostê navenda Pargîn bû ku hertim di şevbuhêrkên dengbêjiyê de hazir dibû. Pargîn berhemek li ser çêkiriye, di milê dîmen û dîtbariyê de bidawî bûye tenê beşê mozîkê maye. Her wiha di milê zarokan de navenda Pargîn hewil didin 360 mamikên zarokan çêbikin ku bi devê wan were gotin, nêzî 150 mamik hazirin niha kar berdewame da ku hijmar temam bibe. Di heman demê de navenda pargîn haziriyaê dike da ku qevdek lîstokên mezin û piçûkan ku zarok dilîzin amade bikin, her lîstokek şîroveya wan di hemû aliyan de heye.

**Astengiyên ku rastî Pargîn tên**

Her tim mirov xwedî hêviye û xwesteka pêkanîna wan hêviyan dike, pargîn gelek piroje li pêşiya wêne lê rastî hin astengiyan tê heya ku bikaribe pirojeyan bidawî bike. Lewma pargîn hêza çareseriyê di xwe de peyda dike, heger ji destpêkê ve endamên pargîn gotiban ew ê çawa xaniyekî ji kavilan ku berî 20 salan kes têde jiyan nekiriye avabikin û wê berê xwe daban bajar li avahiyekî biceh bûban û salek neqedaban wê sazî hatiban girtin ji ber ku wê nenêzî rijhê pirojeya wan ban. Astengiya ku navenda Pargîn dibînin peydakirina mirovên ku werin li ser babetan şîrova bikin, ev yek li cem mirovên temen mezin tenê heye, lê ji ber hatina qonaxa korona ev yek bû astengî li pêşiya wan ku gelek ji van kesên dewlemend bi agahiyan jiyana xwe ji dest dan.  Di heman demê de Pargîn rastî pirsgirêkên abûrî tên ji ber ku tu kes destekî nadê wan di vî milî de, ji ber ku di roja îro de huner bi derfetên piçûk çênabin, pêwîste hinekî rê li pêşiya wê vebe.  Gelek efsaneyên evîniyê hene pêwîste bibin belgefilim lê ev piroje di cihê xwe de mane, ji ber kêm derfetiyê.  Astengî ew e ku mirov bixwe xwe pêş naxin yanî navendek bi vî rengî pêwîste mezin bibe û berfireh bibe, ji ber ku heger navendekî xwe mezin nekir wê demê pêwîstî pê nîne, pêwîste pargîn li Hesekê, Qamişlo û Kobanê hebe û di heman demê de li Tebqa û Reqa jî hebe da ku her netewek çanda xwe pêşkêş bike û biparêze.



## Çêkirina strana azadiyê

**Remezan Olçen**

Heftiya bihurî me li ser girîngiya strîna strana azadiyê nivîsî bû. Vê heftiyê werin em bi hev re li ser vê pirsê bifikirin.  Bi awaz û newaya strana azadiyê mirov dikare bi çi rengî ji bo gelekî hîn hebûna wî di metirsiyê de ye çebike? Em ê di demên qirkirinê de çawa bikaribin strana xwe ya azadiyê bistirên? Muzîk bi tilsim e, bi efsûn e li deriyê dil dide, ruh pê aş dibe. Hem ji bo kes wisa ye hem ji bo kom û civak. Ji ber wê hindê jî gelek girîng e ku mirov wî zimanî bikaribe bi hostatî bi kar bîne.  Ji bo vê jî hîs lazim e. Ev huner bi derewan pêş nakeve. Hîs derewan nakin. Hîsên derewîn jî tine ne. Madem hostatiya vê hunerê anîna ziman û îcrakirina wê hîse, nexwe divê ev huner xwe ji çavkaniyê xwedî bike.

Gelek stranên xweş hene ku di dewrekî de tên guhdarkirin û xîtabî dewrekî din nake. Ev jî heye, rast e lê hin stran jî hene ji dewrên kevn hea roja îro li ser zar û ziman e. Sedema xwe ew e ku ev stranên hanê xwe ji çavkaniya xwe qut nekiriye.  Têhna xwe bi çavkaniyê şikandiye. Din ava civakê de fesiliye û kemiliye. Bi civakê re, bi êş û şadiyên civakê re li hev hatiye lewma tê de nirx hene, nirxên civakê ku civak xwe tê de dibîne. Ji lewma jî dem ali wan stranan guhdar dike; dibe ya xwe, dibe xwe.

Di serdema bajarvaniyê de bi pergala modernîst, şêwaza danîna stranan jî guherî. Ji civakê zêdetir berê xwe da ferdên civakê. Têkçûn, veqetîn, hîcran û fîraxa kesî bû navenda danîna stranê û anîna ziman a wê melodram û trajediyê. Ji ber wê jî erê civaka ku ji kesan çêdibe heta radeyekê guhê xwe da van stranan lê li aliyekî dilê xwe jî tim dizanî ku ev strana han ne êş û ne jî şadiya wê dibêje. Ev li trajedya kesekî/ê guhdar dike û dixwaze xwe tê de bibîne lê naxêr ev nabe. Ev kiras li bejna civaka ku ji kesan çêbibe jî ji kesan mezintir e teng tê.

Ji ber wê jî di vî demî de ku civaka êşiyayî ya Kurd dixwaze li stranên xwe guhdar bike. Li Rojava li qadên şoreşa jinê bi saya sazûmaniyên wek Pargîn û Hunergeha Welat em dibînin ku bê ka mirov dikare çawa strann li deriyê dilê civakê dixe çawa dikare bê çêkirin? Dem ew dem e ku em van stranên xwe zêdetir bikin. Dem ew dem e ku em hîn bêhtir li nava civakê li gorî rastî û heqîqeta wê stranên azadiyê çêbikin. Li her gotin û her dengê newaya xwe baldar bin ku em bizanibin ew stran wê bibe drewşa civaka me ku pê dimeşe azadiyê.

Em ji bîr nekin ku Zerdeştê Kal jî bi Gathayên xwe yên ku hemû stran bûn, felsefeyeke nû danî. Rêya azadî û felatê ji qewmên Medya re nîşan da û Med bi wan Gathayan bi ser dijminên xwe ve meşiyan û bi ser ketin. Awaz û Newa ji ber wê dema heqîqetê tînin ziman û civak bi wê heqîqetê dimeşe tu hêz nikare xwe li ber wê civaka ku strana azadiyê distirê xwe bigre û bisekine.

# Xîtaba kîn û nefretê û têkoşîna li hemberî wê

Nivîskar û danerê di qada geşpêdana mirovî de Hejar Rustem Abdulfetah rave kir ku xîtaba kîn û nefretê diyardeyeke ku ewlehiya aştiyane li Sûriyê tehdît dike, herwiha tekez kir ku têgihştin û hişyariya civakê çareseriya herî guncaw e ji bo sînordarkirina vê diyardeyê di Sûriyê û tevahî cîhanê de.

**Esma Mistefa/ Qamişlo**

Xîtaba kîn û nefretê diyardeyeke ku di nava civakan de tê dîtin. Ev diyarde xwe dispêre hundirê mirov ku neqebûlkirin û nehezkirina însanê li hember xwe tê dîtin. Helbet ev yek li dijî pîvan û exlaqê mirovahiyê ye. Ev diyarde di encama gelek hesan û hisiyetan de tê ku li hember her ferdekî tê bikaranîn û di hundir her ferdekî de jî kêm zêde heye. Caran ku mirov mabesta wî ne êşandina yê li hember xwe ye, lê bi rêbazekê ev yek tê pêkanîn û dibe sedema şikestina yê li hember xwe. Divê mirv di aliyê hilbijartina gotin û axaftinên xwe di dema xîtaba, nîqaş û axaftina bi kesekî re ger mijar çi dibe bila bibe dike, divê baş hilbijêre û bi baldarî ji dev derbikevin. Gotinek pêşiyan jî dibêje (Heyanî gotin di qirika te de ye, ew koleyê te ye. Lê dema ji qirika te derket, tu dibe koleyî gotinê) Ev di aliyê kes de em dikarin pênase bikin. Lê ji aliyê pergala desthilatdar û berjewendîparêz ve jî ev yek hatiye belavkirin û tê pêkanîn. Ev diyarde di navbera dewlet, rêxistin, partî û komên nijadperest û olperest de bi taybet tên sepandin û bikaranîn. Her tim armanca wan tunekirin û pêkanîna berjewendiyên xwe, avakirina tevlêheviyan di navbera gelan û netewan de û hwd. Ev bi serê xwe bûye diyardeyekî gelemperî di serdema heyî de. Her yek ji bo tunekirin û biçûkxistina yê din, vê rêbazê li ser sosyal mediya û ragihandinê bikar tîne. Gelo da ku tu hebûna xwe mayînde bike, divê tu yê li hember xwe tune bike? Mixabin li ser asta cîhanê û ji aliyê hêz û sîstemên navendî û kapîtalîst ve ev yek bi giranî tê dîtin. Bi taybet bi serdema lezbûn û înternêtê re ev yek zêdetir hatiye bikar anîn.

Mînak; Bi destpêkirina alûziya Sûriyê re gelek alî û komên ku ji bo belavkirina xîtaba kîn û nefretê gelek xebat dan meşandin ku bûn sedema belavkirina dijberî û kînê di nava civakê de. Bi serdema lezbûn û medyaya civakî re, platformên ji bo belavbûna vê yekê zêde bûne û ev yek bûye sedema belavbûna bilez a gotinên nefretê ku xwe dispêrin nijadperestî, cudakarî û dûrxistina yên din. Bi qonaxa hesas a ku Sûriye tê re derbas dibe re, ev tewrî zêde bûye û bûye astengiyek ji bo aramiya welêt.

**Di Sûriyê de bikaranîna xîtaba kîn û nefretê û kurkirina alûziyê**

Têkildarî diyardeya Xîtaba Kîn û Nefretê Dûkturê Pêşketina Mirovî Hejar Rustem ji rojnameya me re axivî û wiha got: "Xîtaba Kîn û Nefretê ne tenê bi rêjîmên otorîter ve sînordar e, lê di heman demê de ji hêla rêxistinên ku di vê dawiyê de di alûziya Sûriyeyê de derketine holê de jî hatiye bikar anîn. Wek rêxistinên terorîst, DAIŞ'ê bi çandina fikarên tundiyê û bikaranîna îslamê her wiha derxistina hin aliyan li ser navê olê, nefret û fikra îslama tund belav kir û bi vî awayî gelek kes tevlê xwe kirin. Belavbûna gotinên nefretê ku me di destpêka krîza Sûriyeyê de dît, ji ber çend faktorên civakî, psîkolojîk û çandî ye ku ferd û rêxistinan teşwîq kirin ku bi hestên dijminahî û nefretê li hember yên din bisekinin û hevdû qebûl nekin. Nezanînê roleke girîng di belavbûna vê gotarê de lîst. Civatek ku ne li ser ramana rexne û nirxandinê be, ne jî li ser zimanê lêkolîn û deduksiyonê ji bo gihîştina rastiyê ava bibe, bi vî awayî dikare bi hêsanî were kontrol kirin."

Her wiha Hejar destnîşan kir ku aliyên ku xwestine kîn û nefreta li ser esasê nefreta mezhebî û nijadî di Sûriyê de avabikin, gihîştin armancên xwe û got: "Rejîm, sazî û kesên ku bi belavkirina nefretê re eleqedar in, li ser çend aliyên weke girêdana etnîkî û olî, lîstin. Yek ji rêbazên girîng ên ku şîrket û rêxistinan jê sûd wergirtine, bikaranîna rewşa aborî û rewşa civakî ye di gihîştina armancên xwe de û xizmetkirina berjewendiyên xwe bi rêya belavkirina ramanên nefret û dijberiyê."

**Girîngiya rola ragihandinê di xîtaba kîn û nefretê de**

Hejar tekkez kir ku roleke girîng a ragihandinê di vî warî de heye û wiha destnîşan kir: "Medya ew otorîteya serdest e ku bi rehetî dikeve nav hemû malan. Amûrên ragihandinê yên iftîradî di nav amûrên herî xeternak de ne ku bandorê li çandina ramanan û belavkirina hin têgehan dikin. Rêbaza ragihandinê di belvkirinê de, rêbaza herî bi lez a serdema nû ye, ku dikarin bi riya ragihandinê û medya civakî pir bi lez fikir û armancên ku dixwazin




pêk bînin; bighînin encamê. Her wiha kontrolkirina li ser vê yekê gelek dijwar e. Ev rêbaz dikare bi riya belavkirina hin dîmen û wêneyan li ser mejiyê mirov hakim bibe û bandor bike".

**Çawaniya sînordarkirina vê diyardeyê**

Hejar di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser kêmkirina ji diyardeya xîtaba kîn û nefretê û wiha got: "Riya sînordarkirina vê diyardeyê, belavkirina hişmendiya li ser cidiyeta meseleyê ye. Her wiha spartina zagonên guncav di vê warî de, da ku ev diyarde nebe diyardeyekî ji rêzê. Pêwîst e malbat bi erkên xwe yên bingehîn rabin di çawaniya mezinkirina zarok de, divê li ser bingeha hevdû hezkirin û pêşxistina asta wî/ê ya têgihiştin û serwextbûnê li hember van diyardeya. Ya din perwerdehiya dibistanê, roleke girîng dilîze û li ser têgeha qebûlkirina yên din û biratiya gelan divê bên mezin kirin û perwerde kirin".

# Dibistan bûye mala koçberan

**Dilîn Ehmed/Qamişlo**



**Ji ber şert û mercên zehmet yê ku xwediyê xaniyên kirê li ser kirêçiyan ferz dike, koçberên Efrînê ji neçarî dibistan ji xwe re kirine maleke demikî. Hevseroka Komîna Dibistanê Meryem Sîdo diyar kir ku pêwîstiya wan bi alîkariyê heye, bi taybetî ji ber germa îsal ya zêde.**

Bi salaye koçberî maye para gelê Sûriyê bi taybetî gelê Kurd, lewra ji ber dagîrkikrina bajarên Kurda ji aliyê dewleta Tirk û komên çete yên girêdayî wê, di van salên dawî de hejmara koçberan zêde bûye. Pitî dagîrkirina bajarê Efrîn xelkê wê neçar man koçberî cihekî bi ewle bibin. Lewra berê xwe dan bajarê Şehba û Şêxmeqsûd ê. Piştî bi cihbûna koçberan ya bi sala, êdî careke din ji ber kiryarên komên çekdar yên girêdayî desthiladara nû ya Şamê, gel berê xwe da bajarê Qamişlo.

Ji ber bihabûna kiriya xaniyan û derfetên kêm yên kar, xelkê koçber dibistan ji xwe re kirin malake demikî. Dibistana Hisên Ebdullah ya taxa Korîş yek ji wan dibistana ye ku malbatên koçber di nava xwe de hewandiye. Ev dibistan ji Îlona 2024 ve ji bo 14 malbat ku ji 60 kesî pêk tê, bûye malek demkî. Di nava wan 36 zarok jî hene (23 keçik û 13 kurik) Temenê wan di nav 1 salan heya 15 salan de ye. Derbarê sardana rojnameya me ji dibistanê re Hevseroka Komîna Dibistanê Meryem Ehmed Sîdo diyar kir ku hewcedariya wan pir bi alîkariyê heye.

Meryem Sîdo axaftina xwe wiha berdewam kir: "Em bûne rojan dihejmêrin ta kuj em ji vê rewşê derkevin. Her malbatek di dibistanê de ji xwe re odeyek girtiye tê de xwarinê çêdikin, cilan dişon serê xwe dişon. Odeyek ji xwe re kirine mîna malekê. Ji vî aliyî de em pir zehmetiyan dikşînin, bi taybetî niha bûye havîn û germ roj bi roj zêde dibe. Di dibistanê de ne merwehe ne jî mûkeyfek heye ku mirov li ber rûnê. Herwiha ji ber ku dibistan di nava avahiya de ye, em nikarin pencerên xwe jî vekirî bihêlin, lewra malbatê ku di avahiya de jiyan dikin ji me ve xuya dikin."

**Ji maf û pêdiviyên jiyanê bê par in**

Cihê serşokê li dibistanê nîn bû herwiha destşoyên wan jî her tim têne girtin. Ji vî aliyê de malbat pir bi gazin bûn lewra girtina destşokan bide sedema derxistina bînên ne xweş. Li ser pêwîstiyê koçbera û pirsgirêkê heyî Meryen axaftina xwe wiha domand: "Pirsgirêka herî mezin ew e ku destşokên me her tim têne girtin û cihê ku mirov xwe lê bişo jî nîne. Em tev dizanin ku di hevînan de mirov nikare ku xwe yan zarokên xwe neşoştî bihêle, lewra ev germa zêde dibe sedema gelek nexweşiyên leaş."

**Pêwîstiya wan bi tîmên tenduristiyê heye**

Ji dema ku malbatên koçber li dibistanê bi cih bûna û heta niha ji bilî carekî Heyva Sor a Kurdî sardana wan nekiriye, ev jî bû cihê gazinê ji aliyê mabata. Li ser vê yakê Meryem diyar ku, ji ber paşguhkirina Heyva Sor a Kurdî û rêxistinên ku ji bo tenduristiya mirova dixebite, nexweşiya xurê(Cerib) di nava wan de belav bû. Ji bilî vê yekê di nav welatiyên koçber yên bi temen mezin û nexweş hene û her tin hewcedariya wan bi dermanan heye. Ew ji ber kêmbûna derfeta kar nikarin her tişî ji derve bikirin.

**Hêviya wan çareserkirina pirsgirêkên heyî ye**

Meryem Sîdo derbarê giranbûna vê rewşê de wiha li axaftina xwe zêde kir: "Ji ber bihabûna kirîn û dagirtina balonê xaze, malbat neçar mane ku mîna dem û dewranê berê paporên gaze bi kar bînin. Ev jî bi xetere, herwiha ji ber dûmana wê mirov nikare nefesa xwe bikişîne. Ji bilî wê di germê de îhtîmala teqîna wê zêde ye."

Hevseroka Komîna Dibistanê Meryem Ehmed Sîdo di dawiya axaftina xwe de bang li tevahiya rêxistinên mirovî kirk u di zûtirîn dem de van pirsgirêkan çareser bikin û wiha got: "Hêviya me ew e ku dengê me bighêje rêxistinên ku xwe dibînin berpirsyarê koçbera û sardana dibistanê bike ta ku pirsgirêkên heyî çareser bike. Lewra rewşa me û ya zarokên me bi zehmete."



**Sedsaliya Sêdareyê**

Hafiz Ahmet Turhalli

Ev sed sale şêxê tekoşer hatiye şehîdkirin. Divê em weke millet buyera şêx Seîdê Kal baş binasin û li gor wê stratejiya ku li beramberî me hatibû pêkanîn têbigihêjin. Millet tenê karin bi naskirina dîroka xwe pêşeroja xwe amade bikin û berdewamiya azdiyê misoger bikin. Dewleta Kemalîst beriya damezrandina xwe; du kongreyên sereke lidar xistin. Yek li Erzûrimê, ya din jî li Sêwazê. Herdû bajar jî bajrê Bakûrê Kurdîstanê ne. Ji bo avakirina Tirkiyê ku bi pêşengiya Mistafa Kemal dihatin damezrandin kar û xebat dihatin kirin. Kongreya Erzûrimê bi civandina Şêx û giragirên Kurdên misilman hate organîzekirin, kesayetên bi bandor tevlî vê kongreyê bûn û têde hate gotin ku ev welatê tê damezrandin, welatê Kurdan û Tirkan e! Guftugo hatin kirin û piştgiriya damezrandina vê dewleta nû hate erêkirin. Bi kongreya Sêwazê jî Kurdên ku pêşengiya milletê me yê Elewî dikirin weke Dede Rusipî hatin civandin û piştgiriya wan ji bo avakirina dewleta nû ku ya Kurd û Tirkan e hate teqezkirin.

Ev herdû kongr bi serpereştiya zanyarên olî yên Misilman, Elewî û kesên li ser civakê bi bandor biserkeftî hatin pêşxistin û hevkariya Kurdan bi vê serdemê hate bidestxistin. Bi avakirina dewletekî nû de, bê Kurdan milletekî din li cem Tirkan nemabûn. Ereban, Balkanan û hemû miletan azadî û serxwebûna xwe bidestxistibûn û ji Osmaniyan veqetiyabûn. Ji ber miletê Kurd wek êl, eşîr û malbatan hatibûn dabeşkirin, ne xwedan rêxistinekî berfireh bûn, mercên têde ne temambûn, mafên xwe yê netewî bi avakirina welatekî nû bi Tirkan re hêsantir didîtin. Piştî komar hate avakirin: bi serpereştiya Mustafa Kemal Kurd ji piştêve hatin xencerkirin. Hêdî hêdî Tirkbûnekî tund li ser milletî me hate ferzkirin. Piştî vê îxaneta Tirkan, tevgera azadiya Kurdan bi serpereştiya Seyîd Ebdulqadir, Xalid begê Cibrî, Şêx Seîd û pêşengên Kurdan, tevgera binavê „Azadî" de lez dan xebatên xwe.

Amedakariyên navxweyî û yên derve dihatin birêvebirin.

Dewleta ku nû hatibû damezrandin, di derbarê vê rêxistinê de xwedan zanyarî bû û ji bo dek û dolaban li serê milletê me bigerîne di nav amadebaşiyan de bû.

Serok û Rêberên Kurdan xistibûn bin fişarê û gellekî ji Rêberên rêxistina „Azadî" desteser kiribûn. Seyîd Ebdulqadir, Xalid Begê Cibrî û kesên pêşengê vê Rêxistinê hatibûn zîndanî kirin û amadekariya sêdareya wan dihat kirin. Amadekariya şoreşê kesên li derve ma bûn pêşdixistin. Şêx Seyîd ji bo amadekariyan di nav gel de digeriya û amdekariyên serhildanê bicîh dikirin.

Dewleta hov ev pêvajo, bi provakasyonekî di meha sibatê de teqand û gelê Kurd bê amadekariyên temamkirî kete nav liv û tevgerê. Şêx Seyîdê Kal û hevalên xwe û aliyekî gelê Kurd ketin nav serhildanê. Şêx Seyîd bi îxaneta navxweyî dîl hate girtin û şoreş hate têkbirin. Bi deh hezaran Kurd hatin kuştin, bi dehan bajar û navçe hatin dorpêçkirin û ruxandin, hezaran gund hatin şewtandin û talankirin. Bi sêdarekirina Şeyx û pêşengên Serhildanê ku endamên rêxistina „Azadî" bûn serhildan hate têkbirin. Roja ku komara qirker û talanker ev serhildana têk bir, dest bi karê tunnebûna Kurdan ji her alî ve kir. Hêzên leşkerî, ol, mekteb û aborî hemû xistin nav tevgerê ku Kurdan ji binî ve tunne bike. Kurd tunne nebûn, hê jî berxwe didin û nêzîkê serkeftinê ne. Ê bidome...



# Ji dema Serxwebûnê ve sîstemên desthilatdariyê li Sûriyê û sîstema herî guncaw ji bo Sûriya îro... (2)

Serdemeke nû di dîroka Sûriyê de bi serkêşiya Partiya Baas dest pê kir ku ew serdem bi tepeserkirina rikberîya siyasî ya resen û kesên rikber dihate naskirin. Di heman demê de di pevçûna wan bi Israîlê re piştgirî da Filistîniyan ku bû sedema rûdana Şerê Hezîrana 1967'an de, şikestina Hezîranê ku di wî şerî de Sûrî, Misir û Urdun zirarên giran li ser destên Israîlê dîtin.

Piştî derbeya sala 1963'an de partî ket nav qeyraneke navxweyî, nakokî û pevçûnên di navbera Nasirî û Baasiyan de û di nav partiyê de di navbera şepêla kevin a ku partî damezrandibû û şepêla nû, endamên Komîteya Leşkerî de, bûyerên kuştinê rû dan. Herwiha Baaskê Selah Cidîd û Hafiz El-Esed karîbûn desthilata xwe ya leşkerî ferz bikin ku di encama vê yekê de Efleq û Bîtar ji Sûriyê derketin û Efleq li Iraqê bi cih bû heta mirina wî di sala 1989'an de. Di sala 1980'î de li parîsê Bîtar hat kuştin; di encamê de partî bû du beş: partîya yekem li ser desthelata Sûriyê, ya duyem jî li ser desthelata Iraqê.

Rewş di vî sînorî de nema ku di navbera Selah cidîd (yê ku xwest berpirsyartîyeke girîng di partîya Baas de bigre) û Hafiz El-Esed (yê ku bûbû wezîrê berevanîyê) dehevrikîyek derket, di encamê de Hafiz El-Esed di sala 1970'ê de li dijî dijberê xwe Selah Cidîd bi derbeyek leşkerî rabû ku ji dûrbûna Cidîd ya ji Şamê sûd girt û ta mirina wî di sala 1993'an de di zindanê de hişt. Ev derbe bi nave Tevgera Sererastkirinê (Elhereke Elteshîhiya) hat naskirin ku di 16'ê Mijdarê de li ser destê Hafiz El-Esed (Endamê desteya serokatîya partîya Baas)û serokerkanê Sûrîyê Mistefa Tlas pêk hat, Ehmed Hesen El-Xetîb wek serokê demkî yê welêt hat destnîşankirin.

**Di sala 1971'an de Sûriyê ket bin zilim û zora desthilata Baas ya Hafiz El-Esed de**

Di sala 1971'an de El-Esed bi fermî bû serokê Sûriyê ku welat derbasî qonaxeke reş û tarî bû, civaka Sûrî jî ma rûbirûyî zordestiya dewleta neteweyî ya navendî, herwiha ma di bin zilim û zora desthelata Baas û serokê wê Hafiz El-Esed de.

Gava yekem di bihêzkirina desthelata El-Esed de, Qedexekirina diyadeya derbeyên leşkerî bû ku ji sala 1949'an ve li Sûriyê diyar bibû. Herwiha El-Esed hevrikîyên navxweyî di nava partiyê de nehişt, artêş jî di destê partiya Baas de hişt û li pêş çend partiyên siyasî yên çepgir û neteweyî rê vekir ku vegerin qada siyasî, lê bêyî ku nêzîkatiyê li desteseriya Baas li ser welat bikin. Di sala 1973'an de di destûra Sûriyê de hat ku partiya Baas partiya serkêş ya welat û civakê ye.

Hafiz El-Esed ji bo serokatiya xwe ji Sûriyê re rêbazeke Mîkafîlî şopand. Desthilat bû navendî, ji aliyê yek partî û yek mirovî ve hat birêvebirin. Wî hewil da ku di her aliyekî jiyana civakî de hebûna xwe çêbike, ew jî bi armanca desteserkirina giştî û çarenûsa kes, civak û ta bi ya xwezayê jî desteser bike. Weke ku Mîkafêlî dibêje, armanc rêgezan rewa dike û ji bo gihiştina armancê, rêgez rewa ye.

Yekem: Sîstem û dezgehên dewletê ji nêz ve û bi hûrbînî hatin çavdêrîkirin: Jixwe Hejmara saziyên ewlekariyê bi navên wan ên cûrbecûr ku li seranserî welat belav bûne, nîşaneyeke diyar e li ser rejîmê ku desteserkirina civak û mirovan armanc dike. Her tişta li ser erdê çêdibe, eger ku biçûk be jî, divê ew saziyên ewlekariyê haya wan jê hebe. Lewra; biryara dawî di dewletê de ya hêza ewlekarî û leşkerî bû.

Duyem: Rêjîmê hewl da ku îdyolojiya xwe ya Baasî bisepîne ji bo avakirin û yekqalibkirina civaka Sûriyê û afirandina welatiyên ji yek rengî, lewra ji bo vê yekê pêk bîne, hemû rêbaz û alav bikar anîn. Hemû saziyên perwerde û fêrkirinê, ji biçûk heta mezin, berpirsyariya fêrkirina welatiyên Sûriyê li ser armanc û xwestekên partîya Baasê û bilindkirina rêberê wê weke parêzvanê ramana Erebî û Ereban û parêzvanê mêrxas yê Filistîniyan û doza wan e, girtin ser mile xwe. Jixwe Silava sibê ku tê de dirûşme, armanc û peymana partiyê tê gotin, baştirîn belge û nîşane ye li ser hewlên partiyê ji bo ferzkirina îdyolojiya xwe li ser mirovên Sûriyê; (welatiyên Sûriyê yên ku bi kerrî re dimeşin, tên neçarkirin ku tevlî refên partiyê bibin; bi vî awayî artêşek ji endamên partiya Baas di dewleta faşîst de pêk tê). Ji bilî perwerdeyê, hemû dezgehên ragihandinê yên dîtinî, dengî û çapemenî ji bo belavkirina



îdyolojiya Baasê hatine desteserkirin û siyaseta ragihandina Sûriyê tenê bi mezinkirina Partiya Baas û serokê wê hat sînordarkirin.

Sêyem: Tu jiyaneke siyasî ji derveyî sîwana partiyê tune ye: Bi vê mezinkirin, payebilindkirin û pîrozkirina serok re tabûrên ewlekarî û leşkeriyê dergehên xwe ji bo pêşwazîkirina çalakvanên siyasî û xwediyên nerînan vekirin. Partiya Baasê tevger û partiyên dijber û yên ne bi siyaseta wî re çewisandin û pirrengiya siyasî di çarçoveya el-Cebhe el-Ewtenîye el-Teqedumîye de ma ku ew jî di bin sîwana Baasê de bû û bi wê bihêz bû. Bûyerên Hemayê mînaka li ber çav e ya li ser hovîtîya dewletê li hember tevgera Ixwanan. Dewletê çalakiyên wan li gel çalakiyên gelek partiyên din (her wekî Partiya komonîst, Partiya Sûrî ya Neteweyî û Civakî, tevger û partiyên siyasî yên kurdî yên ku ji salên 50 yên sedsala 20'an ve hatibûn avakirin) qedexe kir. Endamên van partiyan hatin girtin û zindan bi xwediyên nerînên siyasî hatin dagirtin. Gelek ji wan rastî êşkence, kuştin û sirgonkirinê hatin. Navên mîna Feri Filestîn, girtîgeha Seydnaya û Feri el-Muxaberat el-Cewîye (Saloxgerên asîmanî) dê her tim di bîrdanka êşê ya miletê kurd de bimînin (partiyên navborî tenê weke mînak bûn, gelek partîyên din jî hebûn).

Çarem: Bi qasî projeyên mezin, tiştek qîmetê nade mîr: loma wî dest bi avakirina bendavan kir û bingeha hin projeyên din danî û zanîngeh li Heleb, Laziqiyê û Humsê ava kir, dabînkirin û çeksazkirina çandiniyê pêk anî. Tevî ku zagona veberhênanê ya hejmar 10 a sala 1991'an de derket jî, lê aborî bi beşên wê yên girîng, enerjî û pêwendiyê di destên dewletê de man, an jî bi gotineke din di destê malbata Esed û yên nêzî wan de man. Jixwe tê zanîn ku dahatên betrolê nediketin nav budceyê; ew jî bi behaneya ku ew dahat ji bo artêşa Sûrî diçin (parêzvanên welat û xaka wî). Tevî dahat û gencîneyên Sûriyê yên pir û zengîn, welatiyên Sûrî di bin xêza xizaniyê de bûn.

Jixwe ev jî rêbazekî dewleta netedewletî ye ku bi rêya wê gel diçewisîne û dihêle gel tenê li dabara jiyana xwe û parîya nanê xwe mijûl bibe.

Pêncem: Partîya Baas û erebayetî û ereb: Sûrî di rewşa şer de bi Israîlê re ye, loma divê zagona awarte ku piştî derbeya heştê Adara 1963'an de hat sepandin, bimîne. Vê yekê hişt Baas û serwerên wê jiyana welatiyên Sûrî bixin bin kontrola xwe. Dewletê karîbû bi awayekî mezin li têla erebatîyê bixe û vê têgehê di nav gelê ereb de mezin û belav bike. Herwiha wê doza filestînî bi kar anî, da ku bandorê li hişmendiya welatiyên Sûrî bike û pê bilîze. Ji şerê Tişrînê yê sala 1973'an û heya ketina rêjîmê ve guleyeke tenê li hember dijmin nehat berdan. Li vir divê em tiştekî bi bîra we bixin ku dewletê tu girîngî nedida doza filestînî (berovajî wê). Dewletê saziyeke ewlekariyê bi navê Şaxê Filestînê (feri Filestîn) vekir; da ku ew jî qasîya giritina doza erebên Filestînê li ser milê xwe, bide diyarkirin.

Şeşem: Baas û tevna Sûrî: Dewleta Sûrî li cihêrengiya etnîkî, nijadî (Taîfî), mezhebî û neteweyî nedinêrî ku ew dewlemedîyeke şaristanî û çandî ye, berovajî wê; yek ji girîngtirîn peywirên vê dewleta neteweyî ew bû ku tevna civakî ji hev bixe û bîrdanka komî ya Sûriyan tune bike. Ermen, Suryan û Asûr di bingeha xwe de ereb in û kurd jî pismamên ereban in û gerek e tev di çarçoveya erebî de werin helandin.

Herwiha siyaseta "Ji hev dûr bixe tu yê bi ser bikevî" di navbera pêkhateyan de bi kar anî; çimkî li gor wî her ku civak ji hev ketî be, lawaz û belawela be, ewqasî desteserkirina wî hêsantir dibe. Ji ber wê jî vê rêjîmê hewil da nakokiyên nijadî û neteweyî belav bike û bihêle pêkhate bikevin pêşberî hev, bo nimûne ku sinî dixwazin rêjîma dewleta Baasî ya elewî bixin erdê, elewî dijminên sinîyan e dixwazin wan ji holê rakin û kurd jî, ji ber kêmbûna girêdana wan bi welat ve astengiyan dikişînin û xwe bi dewletên derve ve girê didin û dixwazin beşekê ji xaka Sûriyê bibin û ereb welatiyên herî lipêş û di pileya yekem de ne û xwedî hemû mafên çandî di dewleta xwe de ne û ne ji mafê kurd, ermen, suryan û asûriyan ne ku bi zimanê xwe yê dayikê fêr bibin û şaristaniya xwe ya çandî pêşan bidin. Li gor wê, welatiyên Sûrî yê baş ew e yê ku di çarçoveya erebayetiyê de xwe bihelîne. Di encamê de rêjîma dewleta neteweyî ya navendî, rêjîmeke giştgir û navendî ye, silogana wê sitemkarî û zordarî ye.

**Navenda Rojava Ya Lêkolînên Stratejîk**

# Di dîrokê de têkiliyên Kurd û Tirkan

**Amara Baran/Qamişlo**

Tekîliyê Kurd û Tirkan bingeha xwe ji salên hezarî piştî zayînê, digre. Di serdema Ebesiyan de Tirkên Asyaya Navîn ji ber ku pere dabûn leşkerên artêşa mislîmîn, ev jî hişt bi hezaran Tirk koçber bibin. Piştî koçberiya Tirkan qedera Rojhilata navîn jî hat guhertin, gelek bajar hatin wêrankirin û xwestin demografiya heremê jî bidin guhertin. Wek hemû gelên Rojhilata Navîn Kurdan jî para xwe ji wî zilm û zordariyê girt. Di sala 1051'ê de Tirkên Selçûqî di sala 1131'ê Tirkên Moxol û di sala 1402'an de jî Tîmûrê Lenger erîşan dibin ser Kurdistanê, di encama wan êrîşan de zirarek mezin digihêje Kurdan. Heta niha jî bandora wan êrîşan li ser Kurdan heye û gelek bajarên Kurdan ji aliyê Tirkan ve hatiye dagirkirin û nûfûsek mezin yên Tirkan li wan bajaran heye. Koça Tirkan bû sedema guherîna demografiya Kurdistanê. Di sala 1185'an de şereke mezin di navbera Kurd û Tirkmenan de dest pê dike.




### Kurdan li hemberî tifaqan xwesertiya xwe parastine

Qonaxa destpêkê ya vê tifaqê bi ketina Anatolyayê ya Tirkan dest pêkiriye. Di encama ku li dijî Bîzansa tifaqek hevbeş hatiye avakirin de Împaratoriya Bîzansî têk çûye. Di wir de Kurdan di sîstem û tifaqên hatine çêkirin de xweseriya xwe parastine û hebûna xwe domandine qanaxa duyemîn ku bi serdema Yavuz e, ku bingeha Împaratoriya Osmanî girêdayê pêşketina tifaqa Kurd û Tirka ne. Serdema împaratoriya Osmanî deyndarê îtîfaqa ku hatiye avakirin e, Kurdan di wî serdemê de xweseriya xwe pêşxistiye û xistine bin parastinê. Qonaxa dûyemîn jî serdema avabûna komarê ye tekoşîna rizgariya netewî ku li dijî hêzên ku erdê osmaniya parve kiribûn hatiye meşandin e. pêvajoya tifaqa kurd û tirkan ku Atatûrk kongreyên sîvas û Erzûrimê ku li Antalya û Îzmîrê avakirine bûye bingeha avakirina komarê di hersê qonaxan de tekîliyê Kurd û tirkan hevkriyeke siyasî, heqîqeteke civakî û stratejik û hevbeşiya çarenûsê ye.

### Rojhilata Navîn derbasî qonaxa çaremîn dibe

Di pêvajoya avakirina komarê de stratejiya ji bo kurdan xweseriya jiyana hevpar, bi formûlên netew dewletê yên yekperest, navendperest, hemrengkirinê hatiye înkarkirin pêvajoyek pir naik a deformekirinê hatiye destpêkirin. Nihajî qonaxeke dîrokî ya nû tê jiyîn, bi destpêkirina pêvajoya ji nû ve dîzaynkirina Rojhilata navîn dikevin qonaxa çaremin. Felsefeya ji nûve înşabûnê ya qonaxa çaremin, de bê kurd qirîzek mezin tê jiyîn. Tekîliyê kurd û Tirkan ji aliyê dîrokî ve taybet di 200 salên dawiyê de ji ber netewperestî, yekperestî, netewdewlet , endustryalîzîm û sîstema faydeya kapîtîlazmê a 100 salî têk çûye. Pratîkên ku pişte komarê di encama polîtikayên yekperest, homojenkirina de bi pêşketinê yên wekî înkar tepisandin ji xwe nehisabindin wek dijminê xwe dîtin bi nîjadkujiya, siyasî, çandî û fîzîkî helandin tasfiye kirin, Ji bo tifaqa kurdan di navbera gelan de diwarên hişmendî, rûhî û fîzîkî avakirine. Ji nûve avakirin û zindîkirina wan tekîliyên ku bi tekîliyên dîrokî hatine avakirin ketine rewşek pir hasas.

### Serdema Osmaniyan


Kurdistana ku demeke dirêj di navbera împaratoriyên sefavî û osmaniyan de qada şer bû, tu caran nebû xwedî hêzeke yekbûyî sala 1639'an de peymana ku di navbera stanbolê îsfehanê de sînor îstîqrar kirin mîrên kurdan daxwaza navendîkirinê ya herdû împaratoriyan gelek caran serî hildan . Di sedsala 19.mîn de ji bo ku muxalefet ji holê rabe Dewleta Alî Osmanî gelek malmezinin kurdan bi paye bilindi wezîfadar dike. Têkiliya kurd û tirkên osmaniyan di dewrana şerên osmaniyan û sefewiyan de germ bû. Her du aliyan dixwast eşîrên kurdan bikêşin aliyê xwe û bi van eşîran şerê dewleta din bikin. Di destpêka sedsala 16ê de Siltanê Osmaniyan Selîm û nêzî 20 mîrên kurd li ser hindek xalan lihev hatin. Ev lihevhatine di dîroka têkiliyên kurd û tirkan de xwedî ciheke taybet e ku piştî vê lihevahatinê ev herdu gel di gelek şeran de alîkariya hev dikir. Lihevhatina van herdu aliyan bi navbeynkariya Îdrîsê Bidlîsî hate pêkanîn. Vê lihevhatinê Kurdistan kir meydana şerê osmaniyan û sefewiyan.

### Nîjadparêziya Tirkan li dijî Kurdan

Nîjadperestiya tirkan li dijî kurdan digîhîje nêzîkê sal berê, Herwiha pirraniya tirkan ji kurdan hez nakin û nîjadperarêzî dikin. Naxwazin kurd bibin xwedanê tiştekî. Bingeha vê nîjadperarêziyê bi pirranî ji aliyê Kemalîzmê ve hate avêtin. İsmet İnönü Di sala 1935an de raporek ji bo Bakurê Kurdistanê amade dike û dide Mustafa Kemal di wê raporê de ji bo kurdan pir xebitiye ku asîmîle bike û bike tirk. Wê çaxê paşnavê gelek kurdan dikin "Türk", "Öztürk", "Bozkurt" û hwd Di vê raporê de ji bona Erziromê jî gotiye "Ku em bikaribin di demek kurt de Erziromê pêşvebibin li dijî kurdan bajarekî saxlem ê tirk ava dikin".
Ji ber vê yekê ye ku nîjadperestên herî tûj (pir zêde) ên li dijî kurdan li bajarê Erziromê ne.
Di 1925'an de di Serhildana Şêx Seîd de Şêx Seîd û çil hevalên wî darvekirin.
Di sala 1930'an de 10 an jî 15 hezar kurd li Zîlanê kuştin.
Di sala 1937'an de di Serhildana Dêrsimê de 40 hezar kurd kuştin.

### Rêber Apo tekîliyê Kurd û Tirkan wiha dinirxîne:

"Di Têkiliyên Kurd-Tirk De Pirsgirêka Desthilatdarî û Dewletê Analîzkirina têkiliyên Kurd-Tirk belkî jî mijara herî zor a sosyolojiyê ye. Ji ber ku naverok û cewherê pirsgirêka Kurd nayê zanîn an jî naxwazin fêrî bibin û ji vê jî wêdetir bi gotinên begzadeyan ên ti bingehê wan ên zanistî tine nêzî meseleyê dibin, analîzkirin û jihevderxistina pirsgirêka Kurd zor û zehmet dibe. Ji ber vê sedemê, parêzname bi tevahî hêza zanistên civakî bi kar tîne ji bo têkiliyê rast deyne û gelekî girîng dibîne ku li ser vî bingehî gavê biavêje çareseriyê. Piştî komploya qirkirinê ya 15'ê Sibata 1925'an têkiliyên dîrokî-civakî yên nehsed salan yên ku çiqasî stratejîk bûn ewqasî jî xwe dispartin yek ummetê, bi carekê tine hesibandin. Der barê Kurdan de yeqîn dikirin ku bibêjin 'tine bibe' wê tine bibin. Tiştên ku wê bi fermana Xwedê ya 'bibe' jî nebin, der barê Kurdan de yeqîn kirin kengî bibêjin 'tine bibe' wê tine bibin. Jêdera vê materyalîzma herî çor a metafizîk pozitivîzm bû û ew jî bingehê îdeolojîk ê faşîzma Ewrûpayê bû. Bi vê têgihiştinê di bin serdestiya desthilatdariya wan de kengî fermana 'îmha û înkarê' hate dayîn, yeqîn kirin ku Kurd ê di demeke kin de tine bibin. Kadroyên bermahiyên heman pêkhateyê yeqîn dikirin ku rêbaz û nêzîkatiyên Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê di tesfiyekirina Ermeniyan de bi awayekî serketî pêk anîn, ji bo Kurdan jî wê heman encamê bidin. Van kesan gel û neteweya xwe jî bi vê siyaseta înkar û derewê dan bawerkirin û bi vê jî neman, li hemberî dinyayê mîna ku diyardeyeke bi navê Kurd tinebe tevgeriyan. Mirov heman rastiyê dikare ji bo dîroknasiyê jî bibêje. Mirov dikare bibêje, kêm têkiliyên dîrokê hene bi qasî yên di dîroka şaristanî û dewletên Anatolya û Mezopotamyayê de karibin di nava xwe de yekparebûneke diyalektîkî îfade bikin. Di pêşketina dîroka mirovatiyê de xeta Mezopotamya-Anatolyayê bi rola stûna navendî radibe. Li ser vê xetê, bi vê yekparebûna diyalektîkê û bi rola xwe ya stûna navendî dewlet û şaristaniyên pêşî yên dîrokê ava kirin, ji civakên Sumer û Misrê heta rastiya civakên roja me ya îro bi heman rola xwe radibe û dewam dike. Lê tevî vê yekê, modernîzma dewleta netewe, xeteke sor a înkarê dikişîne ser vê dîrokê û dîrokê ji sifirê ji xwe dide destpêkirin ango xwe destpêka dîrokê qebûl dike û vê jî weke zanist dihesibîne."



## Çare û rêbaz

**Sînan Cûdî**

Rojhilata Navîn li ber şerekî nû ye. Şerê di navbera Îran û Îsraîlê de ku her ku diçe zêde dibe, ne tenê bi bombeyan, lê di heman demê de bi pêlek wêrankirinê ku qadên jiyanê yên gelan wêran dike û nasnamb ya wan tehdîd dike, herêmê dihejîne. Ev şer bendek dîrokî ye ku ne tenê her du dewlet lê di heman demê de hemû gelên li herêmê têne ceribandin.
Pirsa ku "divê gel di demên weha de çi helwestê bigirin", îro ji her demê bêtir girîng e.
Yek ji bersivên herî berbiçav a vê pirsê di pratîka şoreşa Rojava de ye. Rojava, ku di bin serokatiya Kurdan de di şert û mercên kaotîk ên şerê Sûriyeyê de di sala 2011'an de pêk hat, parastinê li hember şer ne tenê wekî erkek leşkerî lê di heman demê de wekî erkek civakî jî dît. Meslîsên ku di bin serokatiya çalak a jinan, aboriya kooperatîf, yekîneyên parastina gel û modela konfederalîzma demokratîk de hatine damezrandin, nîşan dane ku jiyaneke aştiyane dikare di nav şer de jî were avakirin.
Îro, Rojava ji bo gelên Îran, Îsraîl, Lubnan, Sûriye û Iraqê modelek pasîf nîne; Ew celebek berxwedanê ya jiyankirî û îsbatkirî ye.
Prensîba yekem ku Rojava fêrî me kiriye ev e ku divê gel pasîf nemînin.
Şer ne tenê pevçûnên ku ji hêla dewletan ve têne kirin; ew di heman demê de desteserkirina îradeya gel in. Li Rojava, gel rêxistinên herêmî xistine nav tevgerê da ku vê meylê rawestînin: komînên taxan, encumenên jinan û yekîneyên parastina gel wekî alternatîf derketine holê.
Dersa duyemîn a girîng ev e ku jiyanek nû dikare di nav şer de jî were avakirin.
Li Rojava, hilberîna çandiniyê bi rêya kooperatîfan ji nû ve hatiye organîzekirin, perwerde bi zimanê dayikê hatiye damezrandin û wekheviya zayendî bi destûrî hatiye garantîkirin. Van reforman alîkariya sererastkirina tevna civakî ya ku şer wêran kiriye kirine. Ji ber vê yekê, divê gel ne tenê ji bo zindîmanê, lê di heman demê de ji bo biryardana ka ew çawa dixwazin bijîn jî xwe birêxistin bikin.
Prensîba sêyemîn xweparastin e ku ne girêdayî derve be.
Damezrandina YPJ û YPG li Rojava ne tenê pêwîstiyeke leşkerî bû lê di heman demê de pêkanîna mafê gelan ji bo parastina jiyana xwe bû. Ji bo hemû gelên ku îro di bin gefa şer de ne, ev dibe ku ne bi wateya hilgirtina çekan be, lê bi wateya rêxistinkirina ewlehî, xwarin, tenduristî û zanîna xwe ye.
Di encamê de, şer dikare mezin bibe. Dewlet dikarin gelan wekî berdêla hesabên xwe yên jeopolîtîk bidin pêş. Lê wekî ku Rojava nîşan daye, gel ne mecbûr in pasîf bimînin. Berevajî vê, mafê diyarkirina çarenûsê heta di nav şer de jî mimkun e.
Ya ku îro hewce ye, rêxistinkirina hêviyê ye ne tirsê. Avakirinê ye, ne wêrankirinê ye.
Û ev avakirin di destê gelan bi xwe de ye.



# Avabûna komên çete li Sûriyê û kiryarên wan

**Ji destpêkirina kirîza Sûriyê ve bi dehan komên çete ku ji bo berjewendiyên dagirkeriya Tirk tevdigerin hatin avakirin, van koman gelek kiriyarên xirab û komkujî derheqê gelên Sûriyê pêk anîne. Niha jî hewldan tên kirin ku ev çete tevlî artêşa Sûriyê ya nû bên kirin, lê gelên Sûriyê daxwaza dadgehkirina van çeteyan dikin.**

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Piştî destpêkirina şoreşa Sûriyê di sala 2011'an de bi navê 'Cêş Elhur' ango Artêşa Azad li ser destê hin dewletên dijî rêjîma Baasê hat avakirin. Di nav Artêşa Azad de bi dehan komên çekdar hebûn, bi pêşveçûna kirîza Sûriyê ve ji ber berjewendiyên hêzên derve yên ku ew li ser daxwaza xwe tevdigerandin, hatin parçekirin û her komek an hejmarek ji koman ketin bin sîwana dewletên weke dagirkeriya Tirk, Qeter û hwd….
Lê hêza ku rasterast bi bandor bû dagirkeriya Tirk bû, wê destek da DAIŞ'ê, Dêrazorê û Reqa dagir kir û hewl da ku Kobanê dagir bike, lê şikest û DAIŞ bi destê QSD'ê di 2019'an de li Dêrazorê têk çû. Dewleta Tirk dema ku dît DAIŞ lawaz dibe bi taybet piştî şikestina wê li Kûbanê, wê di sala 2017'an de 36 komên çete di bin sîwana Cêş Elwetenî 'Artêşa Niştîmanî de kom kirin. Ev artêş ji sê tûgay pêk dihat, tûgaya yekem Siltan Murad, Tabûra Şîmal û hwd… dihewand nava xwe. Tûgaya duyem ji Koma Emşat, a Hemzat, Koma 23'an, Tabûra Selam û hwd… pêk dihat. Herwiha Tûgaya sêyem ji Ehrar Elşerqiye, Tabûra Weqas hatibû avakirin. Avakirina komên çete di bin sîwana Artêşa Niştîmanî bi saya MÎT a dagirkeriya Tirk bû ku wan ji bo berjewendiyên xwe bi kar bîne.



### Kiriyarên xirab ên çeteyan:

Bi dirêjahiya kirîza Sûriyê komên çete hemû cureyên kiriyarên xirab weke talankirin, işkencekirin, kuştin, revandin û ên di derheqê gelên Sûriyê de pêk anîn. Di destpêka aloziya Sûriyê de êriş li ser Girê Spî, Efrîn, Kobanê, Serêkaniyê heya sala 2014'ê berdewam bûn û YPG û YPJ'ê berxwedanî dikirin. Lê êrişa yekem ku dewleta Tirk bi riya komên çete pêk anî 2016'an de bû ku bajarên Cerablus, Ezaz û Bab hatin dagirkirin. Piştre di 2018'an de Efrîn bû, di encamê de ji destpêka dagirkirinê heta dawiya sala 2024'an, 706 sivîl hatine kuştin, ji wan jî 111 jin û 13 zarok bûn. Herwiha bêtirî 300 hezar şîniyên Efrînê koçber bû û zêdeyî 500 hezar darzeytûn û hwd hatin birîn. Di 19'ê Cotmeha 2019'an de dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê Serêkaniyê û Girê Spî dagir kirin, di encamê de dagirkirina Serêkaniyê û Girê Spî de zêdetirî 300 hezar sivîl koçber bûn û li şûna wan malbatên Ereb, Efxan û Tirkmen hatin bicihkirin. Tevahiya êrişên dagirkeriyê bi awayekî hawayî û bejayî pêk hatin û hemû cureyên çekan, di serî de jî çekên qedexekirî, hatin bikaranîn. Ji destêka dagirkirina herdu bajaran heta dawiya sala 2024'an 228 kesên sivîl jiyana xwe ji dest dan herwiha 808 kes hatin girtin, çarenûsa 294 kes heta roja îro ne diyar e, hem jî 696 kes di bin îşkenceyê de ne.

### Komên çete piştî ketina rêjîma Baas û pêwîstiya cezakirina wan:

Piştî rûxandina rejîma Baasê êdî hemû komên çete yên di bin serweriya Artêşa Niştîmanî ya Sûriyê bi piştgiriya dewleta Tirk a dagirker êrişî Minbicê, Til Rifetê û Şehbahê kirin. Di encama Armanca dagirkeriyê ya sereke ew bû ku Kobanê û Bendava Tişrînê jî dagir bike. Êrişên dagirkeriyê 149 rojan li ser hawirdorê berdewam kir, 25 sivîl û gelke şervanên QSD'ê li ser destê çeteyan û dewleta Tirk hatin şehîdxistin, lê planên çeteyan ji bo dagirkirinê bi ser neketin. Li aliyekî din komên çete, çeteyên biyanî û artêşa Colanî êrişî Berava Sûriyê kirin, di 7, 8 , 9'ê Adarê de zêdyî 1700 kes ji pêkhateya Elewî hatin kuştin, ev êriş heta roja îro didomin. Tevî ku Komîteya Şopandina Rastiyan ji bo komkujiyên Beravê di wê demê de hatibû avakirin, lê heta roja îro bi erkê xwe ranebûye. Ji ber ku ji destpêka komkujiyan heta roja îro komkujî, talankirin û hemû cureyên binpêkirina bi awayekî veşartî bi hinceta bermahiyên rêjîma Baasê tên domandin. Di derbarê heman mijarê de jî Yekîtiya Ewropayî di 28'ê Gulanê de biriyara cezakirina dadgehkirina serkêşên hin komên çete da, ji wan ê bi navê Ebû Emşa (Mihemed Elcasim) serkêşê Koma Emşat. Di meha Pûşberê de jî biriyara fesixkirina hemû komên çete ji hikumeta veguhêz a Şamê hat dayîn, lê eger komên çete bêyî ku bên cezakirin û tevlî artêşa Sûriyê bibin, wê derfeta cezakirina van koman zehmet be.

### Cezakirina dewleta Tirk li ser kiriyarên wê erkekî mirovî ye

Rêxistina Mafê Mirovan ya Sûriyê diyar kir ku di encama derbeyên 69 firokên bêmirov ên dewleta Tirk di sala 2024'an de, 87 tobbaran, 18 aran ji şerên rûbirû, û 20 teqînan de 162 sivîl şehîd bûn. Herwiha di encama derbeyên 43 firokên bêmirov, 38 tobbaranan, 28 caran ji şerên rûbirû, û 53 teqînan de 194 kes birîndar bûn. Herwiha dewleta Tirk û çeteyên wê di 8'ê Çileya sala 2024'an de êrişî Bendava Tişrînê kirin, ev êriş bi berxwedaniya 149 rojan hat domandin. Di encamê de 250 sivîl û di nav de jî 9 rojnamevan birîndar bûn, herwiha 25 sivîl şehîd bûn û di nava wan de 3`ê rojnamevan jî hebûn. Herwiha li gorî zagonên mirovî yên cîhanî divabe li dadgehên navnetewî were cezakirin.

# Veguherînên Demokratîk; Rojhilata Navîn di navbera dû astengiyan de

**Argêş Vîyan**

Rojhilata Navîn qonaxek veguherînê ya girîng dijî ku tê de rojevên herêmî û navneteweyî di nav hev de tê jiyan kirin. Nîşaneya herî berbiçav gûrbûna aloziyên ya li dijî Îranê ye. Lê, ev zêdebûna aloziyê nikare bi tena serê xwe were famkirin; li şûna wê, divê ew di nav pêşdîtinên berfirehtir de were dîtin ku armanc dikin nexşeyên bandor û nêrandinên ji Sûriye heta Urdun, Lubnan û Filistînê ji nû ve xêz bikin. Xetên vê xalê bi kuştina Qasim Silêmanî û Ebû Mecîd el-Muhendis, dorpêçkirina komên Îranî li Iraqê, kuştina Serokkomarê Îranê Îbrahîm Reîsî û kesên pê re di qezaya firokeyê de, û kuştinên li pey hev ên Hesen Nesrallah û serokê Hizbullah piştî êrîşa Hamasê dest pê kirin ku bi hêdî hêdî derkevin holê. Ev xalek wê çerxêye ku di stratejiya Îranê de ji bo serwerbûyina ya li herêmê dide nîşan dan. Di salên piştî wê de, êrîş û zextên siyasî û ewlehiyê di pey hew berdewam kirin. Wan bal kişand ser nêzîkatiyek zêdebûyî ku ne tenê Tehranê armanc girt, lê di heman demê de hewl da ku şiyana wê ya bandorê li derveyî sînorên xwe jî bandor bike.
Armanca sereke ya êrîşên dawî yên Îsraîlê, ku di 13'ê Pûşberê de dest pê kir dema ku Îsraîlê êrîşeke ezmanî ya berfireh li ser binesaziyên leşkerî yên li Îranê kir û fermandarên payebilind ên Pasdarên Şoreşê û zanyarên nukleerî kuştin, xuya dike ku xaleke werçerxê ye: neçarkirina Îranê ku vekişe, an bi xistina wê bin hişmendiya têgihîştina Rojavayî an jî bi hewldana guhertina tevahî ya avahiya rêveberiya wê ye. Ev di heman demê de bi daxuyaniyên balyozê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li Tirkiyê, Thomas J. Barrack re hevdem e, ku "dawiya Peymana Sykes-Picot" ragihand, û qonaxek ji nû ve şêwegirtina Rojhilata Navîn li ser bingehên nû yên ku ji hêla hişmendîya hêz û berjewendiyan ve têne destnîşankirin, ragihand. Di ronahiya van pêşketinan de, ramanên Rêberê Gelan Rêber Abdullah Ocalan her ku diçe girîngtir dibin, ji ber ku ew pêşdarazeke ku rewşenbîrî û zanistî ji bo rewşa heyî pêşkêş dike. Rêber Apo eşkere kiriye ku tiştê ku li Îranê diqewime tenê beşek ji plansaziyekê berfireh e ku paşê dê bigihîje Tirkiyê û ji wê derê wêdetir jî.
Ev yek fikara zêde ya di nav navendên biryarê yên li Enqerê de li ser belavbûna gengaz a modela "Neteweyên Demokratîk" wekî modela rêvebirinê ji bo dewleta netewe ya yekdest eşkere dike. Rêber Apo nêrînên rexnegir û kûr li ser Îranê pêşkêş kiriye, nemaze di çarçoveya analîzên xwe yên li ser aloziyên li Rojhilata Navîn de. Rêber Apo pênase wiha pênase dike: "Tevî hewldanên navendîkirina yekdest û tundrew, "Îran di bingeh de avahiyekê federal e" û pêkanîna "modernîteya demokratîk" dikare deriyek hêviyê ji bo çareseriyek di nav civak û gelên Îranê de veke. Rêber Apo di hemû paraznameyên xwe de bi zelalî diyar kiriye ku "pirsgirêkên li Îranê ne ji paşveçûna çandî an avahiya civakî derdikevin," lê, ji awayê ku dewleta netewe û modernîteya kapîtalîst têne bicîh kirin derdikevin, û ev ji tundrewiya olî ya Serdema Navîn hovtir û paşverûtir in.
Derbarê Îsraîlê de jî, Rêber Apo Îsraîlê wekî "berhemekî xwezayî ya şerên netewe-dewletan" bi pênase dike, ku damezrandina wê bi avakirina dewletên netewe yên Ereb re wekî beşek ji plansaziyekê yekdest a berfirehtir re hevdem bû. Ew nakokiya Ereb-Îsraîlê wekî "hevçûnek pisîk û mişk dibîne ku tê de enerjiya gelên Ereb di şerên pêşwext de têne xerckirin, li şûna avakirina civakên azad û zanist." Ji ber vê yekê, paradîgmaya neteweya demokratîk wekî çareseriyek rasteqîn û dadperwer ji bo aloziyên herêmî, nemaze li Îranê, derdikeve holê. Rêber Abdullah Ocalan banga ji nû ve avakirina têgehek dewletê li ser bingeha pirrengî û naskirina hevbeş dike, li şûna ku xwe bispêre hilweşandina bi zorê ya rejîman an jî zêdebûna dijminatiyê. Gava yekem ew e ku bi tevlîkirina hemî pêkhateyên etnîkî û olî di pêvajoya rêveberiyê de mafnasî, nûnertî û hevsengiya civakî were misoger kirin. Pêşeroja Rojhilata Navîn dê ne tenê li ser bombebaran û êrîşan, lê li ser bingeha veguherîna resen a ji vîna gel derdikeve were avakirin. Di vê çarçoveyê de, ramanên Rêber Abdullah Ocalan nexşerêyekê bingehîn û siyasî ji bo Rojhilata Navîn a nûnertiya hemû pêkhateyan û cihêrengtir pêşkêş dikin, ku tê de nasname hevdu temam dikin, ne ku li hev dikevin û bi hevra jiyan dikin û pergala xwe rêve dibin.

FENER



## Sîstema Temsîla Heqîqeta Civakê Neke Têk Diçe

**Idrîs Henan**

Li Rojhilata Navîn demeke dirêje babelîsoka kirîzan kûr dizivire. Îro jî şikil diguhere. Sîstemên bi peymana Sayks – bîko re bûne desthilatdar, pêxîrtengiyê dijîn û bi têkçûnê re rû bi rû mane. Demek dirêj e bi aloziya Sûriyê re encamek wisa derketiye, îro jî bi şerê Îsraîl – îranê re seynala derbasbûna qonaxeke nû ya Şerê Cîhanê yê Sêyemîn lê dikeve ku sîstemên li gorî heqîqeta hegemoniyê nehatibin kedîkirin, ti şansê wan ê jiyanê nehiştine. Lew re jî, çi sîstemên hewl dane li hemberî îradeya heqîqeta modernîteya sermayedar serî hildin, bi têkçûnê re rû bi rû mane.
Bi gotinek din; ji ber ku nekarîne li hemberî heqîqeta hegemoniyê bibin heqîqeta altirnatîf, îroj bi hemû şiklên xwe mehkûmî têkçûnê bûne û weke kevirên domino yek li pey yekî hildiweşin.
Qewimîn û pêşketinên bi şerê Îran - Îsraîlê re derketine holê, diyar dikin ku asta pevçûnê wê di wir de nemîne û dê hinek derdorên din bişimitîne nava xwe. Di heyamekî wisa de çendîn navên blok, kamp û navên qebe lê hatibin kirin, wê nikaribin li hemberî êrişa veguherîner a hegemoniyê li ber xwe bidin û dê bi zorê mecbûrî guhertinê bibin. Ji ber ku ti para wan di heqîqeta manedar a diyardeya civakî de nîn e, ji bona vê jî nekarîne hebûna xwe ya zir bikin heqîqet ku weke altirnatîfeke azadîxwaz xwe pêşkêş bikin.
Yanê em dikarin bibêjin ku demek e li Rojhilata Navîn blokbûneke nû ya heqîqetê têye avakirin. Ev blokbûn jî girêdayî şiklê nû ya cewherê sîstema sermayedar e ku ew jî ji aliyê xwe ve, mecbûrî guhertin û veguhertina metodên xwe yên mayîndebûnê ye.
Lew re, weke beriya sed salî û vir ve, çawa ku sîstemên dewletdar îrade û heqîqeta wê ya sade qebûl kirine ku hebûna xwe bi diyardeya wê re parastine û xistine misogeriyê, îro jî li ser hîmên heqîqeta nû ya sermayedariyê sîstemên dûvik ku carek din hebûna xwe bixin bin gerantiyê, rîtuelên ajantiyê pêşkêş dikin. Li aliyê dîdtir jî, sîstemên ku hewl didin li hemberî hêza kakil a hegemoniyê li Rojhilata Navîn – Îsraîl – derkevin, di nav pêlên pêxîrtengiyê de nefesa xwe ya dawî dikişînin.
Tabloya îro bi şerê Îsraîl – Îranê re derketiye holê, nîşan dide ku modernîte nahêle derveyî heqîqeta wê ti şiklên din li civakên Rojhilata Navîn bêtên barkirin. Çendîn desthilatdariya Îranê, bi dehê salan, îdîaya nûjeniyê kiribe jî, lê rewşa xapandinê wêdetir derbas nekiriye û bi vê yekê re jî şansê xwe yê jiyanê ji dest daye.
Heqîqeta wê ya paşvemayî ku hewl daye bi metod û alavên xapînok ên kapîtalîzmê xwe îfade bike, ne kariye ziravahiya wê ya ku tenê di fezaya hêza kakil a modernîteyê de tevgeriyaye, ji hilweşînê biparêze ku îro bi rewşeke rûbirûyî heqîqeta xwe ya derew re maye. Vê rewşa nû ya Îranê bandorek mezin li hemsîtemên fena Tirkiyê kiriye ku ta, lerizîn û metirsiya heman narvînê jiyan dike.
Lew re; eger heqîqet nûnertiya hêza jiyanê û temsîla wê neke, nikare îfadeya serketinê bike. ancax serkeftin bi cewherê heqîqetê re pêkan be. Tevgerên îslama siyasî jî ku dûrî cewherê îslamê ne, nikarin bibin altirnatîf û ne jî dikarin bi metodên xwe yên rizyayî li hemberî heqîqeta hegemoniyê li ber xwe bidin. Ancax heqîqeta demokrasî û azadiyê be ku têkoşîna gelan bigihîne serkeftinê.